Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1323 | 9-Mijdar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Helbestvana Kurd Diyala Elî

Hemza Sêvo/ Çilaxa

**Diyala Elî jineke helbestvan a Kurd e ku ximava pênûsa xwe ji bo derbirîna hestên xwe bi kar tîne. Ew ji destpêka qonaxa ciwaniya temenê xwe ve bûye dildara wêjeya Kurdî û berhemek bi zimanê Kurdî derxistiye.**



**Kurtejiyan:**

Diyala Elî di sala 1998'an de li bajarê Çilaxe ji dayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî, navîn û amedehî li wir qedanidiye. Ew derçûya Peymangeha Amadekirina Mamosteyan e, Akademiya Ziman û Wêjeya Kurdî herweha li Zanîngeha Firatê Mafnasî xwendiye û niha li Zanîngeha Rojava Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî dixwîne. Temenê wê 27 sal in û li bajarê Çilaxa mamostetiya Ziman û Wêjeya Kurdî dike.

**Destpêkirina heskirina helbestê li cem Diyala Elî**


Ji destpêka ciwantiyê ve hezkirina wêjeyê li gel wê çêbûye, di destpêkê de wê terzê pexşan dinivîsandin herweha rojnivîsên xwe tomar dikir, paşê bi guhdana bavê xwe û piştgiriya malbata xwe bi israr vîna helbestê li cem wê hat afrandin. Ji termên wêjeyî ew helbesta nûjen dinivîse, mijarên helbestên wê curbecur in, lê herî bêtir Diyala Elî hewl dide ku bi rêya helbestê kêşeyên xwe û mirovan bi giştî xweşik bike. Ew bi zimanê Kurdî dinivîse ji ber ku bêtir îfadeya kesayet û hestên wê dike ji bilî zimanekî din. Helbestvan Diyala Elî di serdema nûjen de helbestên helbestvanên Kurd yên weke Ehmed Huseynî, Rênas Jiyan, Ciwan Qado, Ciwan Nebî û Kemal Necim bêtir dixwîne û dibe ku di gelek deveran de bandora van helbestvanan li wê bûbe. Xwendin û hezkirina wê ji berhemên van kesan re ew e ku rastiya jiyana ya îro di berhemên wan de dibîne tevî rêbazê wan yê nûjen ku Diyala xwe di vî rêbazî de dibîne. Ji bilî helbestê ew gotarên wêjeyî, çandî û civakî dinivîsîne ji ber ku carinan hin mijar hene bi rêya derbirîn, analîz û şîrovekirinê bêtir tên xuyakirin.

**Rola jina rewşenbîr a Kurd di bîrweriya Diyala Elî de**

Di nerîna helbestvana jin Diyala Elî de ew e ku rola jinê di tevgera rewşenbîrî de heya radeyekê baş e, lê ev yek têrê nake ku derbirîna jinan bihêztir bibe, ew hêvî dike ku di demên bê de jin bêtir cihê xwe di vê tevgerê de bigirin. Herwiha Diyala destnîşan dike ku sedema kêmbûna jinan di qadên rewşenbîrî de li gelek rewşan vedigere yek ji wan jî rewşên civakî, malbatî, kevneşopî û hizirê paşverû ye yê ku azadiya kesayeta wê hîna dorpêç dike ye.

**Berhema pêşîn a helbestvan Diyala Elî**

Di dema dawiyê de wê berhema xwe ya pêşîn çap kir di bin serenavê Demsalên Bêkêf de ye, Demsalên Bêkêf dîwana helbestan e zêdetirî sih helbestî di nav xwe de dihewîne bi mijarên cihêreng. Dîwan ji weşanên dezgeha Arta FM e. Gelek dost û hevalên Diyala Elî ramana çapkirina pirtûkê




geş kirin nexasim malbata wê ew atmosfêra afrîneriyê li ba wê gur kir heya ku karîbû yekemîn berhema xwe derxîne. Helbestên di dîwanê de ji dem û serboriyên cuda ne, helbest di demeke diyar de hemû hatine nivîsandin, lê belê helbestên wê yên hilbijartî û komkirî bûn. Nivîsandin ji bo Diyala Elî bi giştî û helbest bi taybet ji bo wê tê wateya rastiya jiyanê, ew ratiya di hundirê her kesî de heye, lê rêbazê derbirînê tê guhertin ji kesekî heya kesekî din li vir peywira wêjeyê tê xuyakirin ku ji bo xweşikbûna jiyanê tev digere. Di demekê de ew hewcedarê gotarê dibe. Diyala Elî eşkere kir ku wê di siberojê de berhemeke helbestan ya nû amade bike.

## Gotina Dawî



### Kurd li aramî û aştiyê digerin!

Mihemed Seydi

Ji Tirkan dipirsin; hûnê heta kengî şerê Kurdan li Sûriyê bikin, bersiva wan ew e ku heta wan qir bikin û tune bibin.
Lê vedigerînin û dipirsin; lê ger we nikarîbû wan bi dawî bikin û li Sûriyê Statu bi dest xistin? Yê Tirk dibêjin; wê demê em ê bi wan re bibin hevalbend.
Ev rastiya siyaseta dewleta Tirk e ku bi salaye hemû derfetên xwe xistiye şerê li dijî Kurdan û statuya wan. Li başûrê Kurdistanê jî heta jê hat şerê Statuya Kurdan kir lê dema çêbû, wê carê wekî ku doste xwe nîşan dide û her dem bi dem an ew li Hewlêrê ne an jî rayedarên Hewlêrê li Enqerê ne. Niha heger ev peywendî ne li dijî aliyekî din ê Kurd bin, tu mafê aliyekî tune ku li hember derkevin lê ger wê zirarê bighîne tiliya yek Kurdekî din, divê normal neyê dîtin.
Heman rewş ji bo Rojavayê Kurdistanê jî ku heta niha jî dewleta Tirk bi hemû awayî di nava hewlên ji navbirina destkeftiyên Kurdan de ye. Lê piştî ku li gel Rêber Ocalan dest bi danûstandinan kir, hinekî gef li gorî demên berê, niha kêmtir bûne.
Li aliyê din, li Tirkiyê jî ji ber gavên ku Rêber Ocalan avêtine û herî dawî vekişîna hêzên Gerîla ji nava sînorên heyî yên Turkiyê, dewlet mejbûrî avêtina gavên berbiçav kiriye. Ev gavên wê dewlet jî bavêje, di nav de hevserokên berê yên HDP Selhedîn Demîrtaş û Fîgen Yuksekdag, hêjmarek ji girtiyên siyasî be.
Dîsa rakirina cezayên li ser çalakvan û siyasetmedarên Kurd ên li derve da ku karibin vegerin Welat. Lê gelo ew ê çi garantiya van gavên dewleta Tirk hebe ger di warê Yasayî û destûrî de guhertin çênebin? Ji ber yên îro li derve bi biryareke serokkomar dikarin werin girtin û yên ku niha girtî ne, cezayê bi salan li wan were birîn.
Herwiha bi pêvajoya di navber Îmralî û dewleta Tirk de, pençên tojkirî yên li ser Rojava jî tên rakirin. Ev jî dide xuyakirin ku dewleta Tirk di siyaseta xwe de têk çûye û lewma serî li rêbazên cuda dide. Dewleta Tirk wiha difikire ku ew ê bibe şirîkê destkeftiyên Kurdan ku bi saya fedekariya bi hezaran keç û xortên Kurd hatine bi dest xistin, ne ku wekî dibêje ew û Kurd bibin şirîkê di welat de. Ew siyaseta ku dibêje yê te yê min û te ye û yê min yê min e dixwaze bimeşîne. Wekî ku niha li başûrê Kurdistanê pêk tîne ku ew dever ji xwe re kiriye bazara firotina berhemên xwe lê dema Kurdek ji Başûr here li bajarên Tirkiyê bibe geştiyar jî, ew ê rastî lêdan û kuştinê were. Karsazê ji Dihokê yê bi navê Hekîm Luqman jî mînake ku sala 2024'an li bajarê Stenbolê ji ber ku bi Kurdî diaxîvî, 12 kesan êrişî wî kir û bi kêran ew kuştin. Lê dîsa jî Kurd bi niyeta aştiyê gavan davêjin, destpêşxeriyê dikin û birînên xwe vedişêrin da aramî were ser vê erdîngariya bixêr û bêr ku ji ber şer û kuştinê westiyaye.
Da hinekî ev milet nefesekê bikşîne û ji jiyanê re destê xwe hilmale, Rêber Ocalan kar dike û di mesajên di hevdîtina dawî bi malbatê re parvekiribû, qale vê mijarê kiribû. Omer Ocalan, biraziyê wî ew gotin parvekirin ku divê girîngî ji bo jiyan û civakê were dayîn û qîmet ji bo mirovan were dayîn.
Di dawiyê de dixwazim bibêjim ku dewleta Tirk her çiqasî hewl dide xwe bike şirîkê destkeftiyên Kurdan û lewma qale biratiyê dike, Ocalan dixwaze nefesekê bide Civaka Kurd da piştî ewqas salên şer, li jiyanê vegere.

Sudoku:Pirs 65

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | | 6 | 9 | | | | | |
| | | 9 | | 1 | | | | 3 |
| 2 | 7 | | 4 | | | | | 6 |
| | 6 | | | 2 | | | 9 | |
| 9 | | 5 | | | | 3 | | 8 |
| | 2 | | | 4 | | | 1 | |
| 7 | | | | | 1 | | 8 | 5 |
| 5 | | | | 7 | | 1 | | |
| | | | | | 5 | 7 | | 2 |

Sudoku: Bersiv 64

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 1 | 2 | 7 | 6 | 3 | 5 | 8 | 4 |
| 7 | 5 | 8 | 4 | 1 | 9 | 6 | 3 | 2 |
| 3 | 6 | 4 | 2 | 5 | 8 | 7 | 1 | 9 |
| 4 | 2 | 5 | 3 | 9 | 7 | 1 | 6 | 8 |
| 1 | 9 | 3 | 8 | 4 | 6 | 2 | 5 | 7 |
| 8 | 7 | 6 | 5 | 2 | 1 | 9 | 4 | 3 |
| 6 | 8 | 1 | 9 | 7 | 4 | 3 | 2 | 5 |
| 2 | 4 | 9 | 1 | 3 | 5 | 8 | 7 | 6 |
| 5 | 3 | 7 | 6 | 8 | 2 | 4 | 9 | 1 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Mêr im kurê mêra me, îro jî mast sibê jî mast:**
- Bi heman wateyê.
**Ne guregura ewran e, ne hirehira hespan e:**
- Ji kesên dikin qîr û hawar netirse.
**Nemerdî nekir:**
- Netirsiya; pakî jê nekir.
**Pisîk ne li mal e navê mişk Evdirehmen e:**
- Ji ber ku tikes nîne dengê xwe lê bike, guhê xwe nade ti kesî.
**Piştvekirî ye:**
- Dijminên wî nînin; natirse.
**Qerqerê wî li serê wî gerandiye:**
- Paxavan ji mirinê nake; ji mirinê natirse.
**Rûvî ji baranê bitirsiya wê ebayek ji xwe re çêkira:**
- Ez natirsim; ez pakiyê ji ti kesî nakim.

**LI SER XETERÊ**

**Ava di golan de dimîne genî dibe:**
- Eger pirsgirêk çareser nebin, bên gîrokirin mezintir dibin.
**Bi agir dilîze:**
- Tiştên bixeter dike, yan dibêje.
**Bi hirçê re dikeve ciwal:**
- Karê bixeter dike.
**Bûye çovê destê dînan:**
- Kengê çi bike ne diyar e, mirovekî bixeter e.
**Çû ser ecelê xwe:**
- Bi cihekî pir bixeter ve çû.
Didanên wî bi cewrîtî rakirine
- Ji zû ve ji xeterbûnê derxistine.
**Em di devê topê de ne:**
- Xetereke pir mezin li ser me ye.
**Guloka agir e:**
- Bixeter e; xetera wê mezin e.
**Gû xwar/gû xwariye:**
- Ket xeterê.
**Mijara man û nemanê ye:**
- Yan emê tine bibin, yan emê bi ser bikevin.
**Mirov tiliya xwe nexe kuna mozan, moz bi mirov ve nadin:**
- Kesê neçe deverên bixeter zerer nagihiyê.
**Mişkan tedbîr girt; gotin em zengilekî bixin stûyê pisîkê:**
- Karê bi tehlûke dike.
**Nan li vir nema:**
- Rewş bixeter e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Em ji aliyê rih û mejî ve girêdayî Rêber Apo ne'

Endama Kordînasyona Meclisa Îştar Qîmet Neraxî diyar kir ku gelê Mexmûrê ji 20`ê Tîrmeha 2023`an de ji bo misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo çalakiyên xwe didomînin û wiha got, "Heta Rêber Apo azad nebe, wê çalakiyên me bidomin, em ji aliyê rih û mejî xwe ve girêdayî Rêber Apo ne."**R-6**



## Di cîhanê de 9 welatên ku tê de astengkirina xwendina jin didome

Di serdema heyî de yek ji trajediyên ku mirov pê bandor dibe, ew e ku di nava ewqas pêşketinên serdemê de hîna jî jin di bin şidet, bêedaletî û kiryarên di bin sedemên cur bi cur de ne. Ev hişmendî hêştiye ku jin ji mafên xwe yên herî rewa mehrûm bibin.**R-2**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1323 | 9-Mijdar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S



## 'Çarenûsa Kurdistan û Rojhilata Navîn ne şer e'

Jinên Ciwan yên PYD`ê diyar kirin ku baweriya wan bi pêvajoya aştiyê heye û bi beşdariya ciwan û tevahiya civakê wê aştî û jiyana hevgirtî pêk were û gotin, "Divê ciwan bi çalakiyên cuda beşdarî pêvajoya aştiyê bibin, ji ber ku çarenûsa Kurdistanê û Rojhilata Navîn ne şer e, Rêber Apo rê li ber azadiya gelan vedike."**R-5**

# KAMÎRAN BERWARÎ : XWEVEKIŞANDINA GERÎLA QONAXEKE NÛ JI BO AŞTIYÊ YE

Akademisyen Kamîran Berwarî diyar kir ku bi banga dirokî ya Rêber Apo re Tevgera Azadiyê derbasî qonaxeke nû bûye û destnîşan kir ku şewitandina çêkan û vekişandina gerîla ji sînorê Bakurê Kurdistanê gavên ji bo çareseriyê ne.**R-4**





## Ji çiraxên hunera Kurdî

Hunermendê Kurd Delîl Mîrsaz çemek ji awazan e ku tu carî naçike û kaniyek ji helbestan e ku teqez zuha nabe"**R-7**



## Diyalogên di navbera Îmraliyê û Tirkiyê de...(2)

Bi banga dîrokî ya Rêber Apo ku di 27'ê Sibatê de kiribû, dengvedanek li Rojhilata Navîn û Cîhanê kir. Dewleta Tirk ya ku hebûna Tevgera Azadiyê û gelê Kurd tune dihesiband û êrîşên qirkirinê pêk dianî, di 1'ê Cotmeha 2024'an de bi silavdayîna serokê MHP'ê Dewlet Bahçelî bi koma Partiya DEM'ê re pêvajo derbasî qonaxeke dîrokî bû.**R-3**

Çalakvanên Aştî û Demokrasiyê — İsyan Karadeniz R-2


Dilê dadweriyê li Rojava lêdide — Sînan Cûdî R-4


Aqil Malê Esad Be Aqûbet Jî Dê Li Cem Esad Be! — Idrîs Henan R-5


Çareserî an tevlîhevî — Hafiz Ahmet Turhalli R-6


Krîza vegêranê, dizîna bêdengiyê — Remezan Olçen R-7

# Di cîhanê de 9 welatên ku tê de astengkirina xwendina jin didome

Di serdema heyî de yek ji trajediyên ku mirov pê bandor dibe, ew e ku di nava ewqas pêşketinên serdemê de hîna jî jin di bin şidet, bêedaletî û kiryarên di bin sedemên cur bi cur de ne. Ev hişmendî hêştiye ku jin ji mafên xwe yên herî rewa mehrûm bibin. Yek ji van diyardeyan jî qedexekirin û astengkirina xwendin û zanista jinê ye.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Yek ji van welatên ku herî zêde li hember xwendina jinan dibe asteng û qedexe dike, Afganditan e; Afganistan heya niha jî rê nade ku jin di navîn, zanîngeh û xwendinên bilin de bixwînin. Di Afganistan de 1.4 milyon keç hîn jî ji aliyê rayedar û desthilatdariyê ve ji dibistanê tên dûrxistin. Ev yek ne ku ji dema nêz ve wisa ye, bi deh sala ye ev hişmendî di nava Afganistanê de tê birêvebirin. Helbet ev zihniyet xwe dispêre sîstema olî a tund ku tê meşandine. Di heman demê de li welatên Efrîqiyayê herî zêde ji ber rewşa civakî a belav, xizaniya zêde, hişmendiya civakê, zewicandina temenê biçûk û cudahiya di navbera her du zayenan de, xwendina keçan asteng dikin.

Di vê çarçoveyê de ne tenê Afganistan lihember xwendina jinan dibe asteng, hin welatên din yên cîhanê vê yekê di bin sedemên cur be cur de pêk tînin û a herî zêde jî di parêzgeha Afrîqiyayê. Ji wan welatan jî Afganistan, Başûrê Afrîqiyayê, Komara Efrîqeya Navîn, Nîjir, Tşad, Malî, Gîniya, Burkîna Faso, Esyobiya û Yemen.

Di vê raporê de em ê li ser qedexekirin û astengkirina xwendin jin, her wiha li hember zanebûn û zanista jinê sekinin, di bin çi zihniyet, şert û mercan de pêk tê bisekinin.

Afganistan: Afgansitan welatê yekemîn di cîhanê de ku li hember xwendina jin dibe asteng û qedexe dike ye. Ev yek jî ji aliyê desthilata Talîban ve tê pêk anîn. Bi vê yekê re Afganistan welatê ku heya niha xwendina jin û keçan a navîn û xwendina bilind bi tundî qedexe dike ye.

Qedexeya perwerdehiya keçan li Afganistanê bi giranî ji ber polîtîkayên Talîbanê ye ku piştî vekişîna hêzên Amerîkî di sala 2021'an de vegeriyan ser desthilatê.

Sedemên sereke yên ku ji hêla Talîban ve hatine destnîşankirin an jî ji hêla çavdêran ve ji bo vê qedexeyê hatine dîtin ev in:

1- Şîrovekirina olî ya tund: Talîban berî ku destûrê bide keçan ku vegerin dibistanên navîn û zanîngehan, û li gorî şîroveya wan dibêje ku ew dixwaze "hawîrdorek perwerdehiya îslamî ya guncaw peyda bike", îdia dike ku avahiya heyî "li gorî qanûna îslamî nîne".

2-Sînorkirinên Civakî û Çandî: Hin civakên Afganistanê pir muhafezekar e, û nêrînek kevneşopî heye ku rolên jinan divê bi mal û malbatê ve sînordar bin, ev yek Talîbanê teşwîq dike ku van helwestan qebûl bikin da ku normên xwe yên civakî bicîh bînin.

3-Kontrola Siyasî: Mehrûmkirina keçan ji perwerdeyê rêbazek kontrola civakî û siyasî ye, ji ber ku ew rola jinan di civakê de qels dike û rê li ber beşdarbûna wan di jiyana giştî de an jî derfeta wan a têkoşîna li hember desthilatdariyê digre.

4-Nebûna zexteke navneteweyî ya bi bandor: Tevî şermezarkirina Neteweyên Yekbûyî û gelek welatan, Talîban rastî cezayên têrker nehat ku wan neçar bikin ku biryara xwe paşve bikişînin. Ev bû sedem ku siyaseta xwe heya niha bide bimeşîne.

Xulase; Ji sala 2021'an vir ve, dibistanên navîn û zanîngeh ji keçan re hatine girtin, ev yek bi mîlyonan xwendekarên jin ji mafê perwerdehiyê bêpar kiriye û bandorek giran li ser pêşeroja jinan û civaka Afganî bi tevahî kiriye. Her wiha di fakulteyên Tib û peymangehên tenduristiyê de û hin cihên kar û xebatan de destûr nade ku jin tê de bixwînin û bixebitin.

Di heman demê de li gorî Raporeke UNESCO'yê destnîşan dike ku li hin deveran nêzîkî ji sedî 75'ê keçan perwerdehiya dibistanê nabînin.

Başûrê Afrîqiyayê: Li gorî raporek ONE.org (Rêxistineke cîhanî û bê alî ye ku ji bo bidawîkirina xizaniya zêde û baştirkirina rewşa tenduristiyê li Afrîkayê dixebite). Ev hate tesbîtkirin, ew yek ji deh welatên herî zehmete ku zarokên keç perwerde bibînin, ku bi qasî ji sedî 73'ê keçan naçin dibistana seretayî.

Li Afrîkaya Başûr, wekî li hin welatên din ên wekî Afganistanê, ti qedexeyek fermî an jî hikumî li ser perwerdehiya keçan tune ye. Lêbelê, faktorên, şert û mercên civakî û aborî hene ku dibin sedema ku hejmareke mezin ji keçan dev ji dibistanê berdin û perwerdehiya xwe temam nekin.



### Sedemên ku rê nade zarokên keç û jin bikaribin bixwînin

Ji wan jî em dikarin van bînin ziman: (Xizanî û zehmetiya gihîştina perwerdeyê, Zewaca zarokan û ducanîya zû, destdirêjî û tundûtûjiya li dibistanan li ser keçan, Qelsbûna binesaziya perwerdehiyê ya li deverên gundewarî, tunebûna serwextbûna li ser girîngiya perwerdehiya keçan).

Ev diyardeyên ku hatine tesbîtkirin, ji tunebûna rola dewletê di nava civakê her wiha ji rewşa civakî a xizan û belave tê. Helbet ev yek dewlet û hikumeta wê sûcdar e ku nikare derfetên jiyanê a gel baştir bike. Her wiha tunekirina maf û rola jin di civakê de ku bi vê yekê re jin ji mafê xwe ya herî rewa bêpar e. Li şûna peydakirina derfetan ji xwendina keçan re, rê li ber zewicandina wan a bi temenê biçûk vedikin û li pêşiya wê yekê nabin asteng. Di vir de mirov ji wan pirs bike; Gelo hûn çima li pêşiya zewaca wan nabin asteng, lê li pêşiya zanebûn û xwendina jin hûn dibin asteng û tu derfetan peyda nakin?

Nîjer: Bi fermî Komara Nîjerê, welatekî li rojavayê Afrîqayê ye. Li Nîjerê, rêjeyên zewaca zarokan di nav yên herî bilind ên cîhanê de ye. Gelek keç neçar dimînin ku di temenê biçûk de dev ji dibistanê berdin da ku bizewicin an jî wekî karkerên malê bixebitin. Her wiha deverên gundewarî ji kêmbûna dibistan û mamosteyên jin azarê dikişînin û nikarin bixwînin. Ev yek gihîştina perwerdehiyê hema hema ne mumkin dike. Rêxistinên mafên mirovan piştrast dikin ku normên civakî ango kevneşopya civakî perwerdehiya keçan hewce nabînin ku ev jî cudahiya di navbera mêr û jinan de di derfetên perwerdehiyê de diyar dike.

Gîniye: Bi fermî Komara Gînê, welatek li rojavayê Afrîqayê ye. Li Gîneyê jî rewş ne pir cuda ye. Xizanî, binesaziya xirab û cudakariya zayendî gelek malbatan neçar dike ku perwerdehiya kurên xwe li şûna keçên xwe bidin pêşiyê. Her wiha hin keç jî rastî şîdet û tacîza dibistanê tên, ev yek jî dibe sedem ku malbat ji ber tirsa li ser ewlehiya wan rê li ber wan bigirin ku neçin dibistanê.

Her wiha welatên weke Esyobiya: Bi fermi Komara Federal a Demokratîk a Esyopyayê, Ew welatekî bêderya ye ku li Qiloçê Afrqayê ye. Yemen: Welatekî erebî ye ku li başûrê rojavayê Nîvgirava Erebî li Rojavayê Asyayê ye. Burkîna Faso: Ew li welatên Çola Sahrayê ya Afrîqayê ye. Tşad: Welatekî bêderya ye ku li ser xaçerêya Bakur û Navîn a Afrîqayê ye. Malî: Bi fermî Komara Maliyê, welatekî li Rojavayê Afrîqayê ye ku ew jî bê derya ye.

Bi gelemperî jin ji ber gelek sedemên civakî û siyasî di gihîştina perwerdehiyê de rastî zehmetiyên girîng tên. Ji wan sedeman jî herî zêde ku di van welatên me dane pênasekirin de ev in; Xizanî û şert û mercên jiyanê yên xirab, Pevçûn û şer, Zewaca zû, Rêûresm û kevneşopiyên civakî, Dûrbûna dibistanan û nebûna ewlehiyê,Nebûna mamoste û binesaziyê.

---

**Akademiya Jîneolojî**

## Çalakvanên Aştî û Demokrasiyê

**İsyan Karadeniz**

Pêvajoyên aştiyê yên di encama têkoşîna çekdarî ya tevgerên rizgariyê dest pê kirine, li her welatî xwedî rastiyên taybet ên dîrokî, çandî û siyasî ne. Cudahî, hem di aliyê şert û mercên civakî û aborî de, hem di siyasetên hêzên herêmî û hegemon de hem jî di aliyê bîrdozî, asta rêxistinbûn û siyasetên tevgerên rizgariyê de derdikevin holê. Ji Şerê Cîhanê yê Yekemîn ve, jinên ji welat û tevgerên cuda weke çalakvanên aştiyê hewldanên girîng ji bo guhertina pergala serdestiya mêr-dewletê, nijadperestî û kedxwariyê bi pêş xistin. Rêber Apo di parêznameya Sosyolojiya Azadî de aştî weke 'lihevkirinek navbera demokrasî û dewletê' pênase dike. Li ser bingeha ku 'Di aştiyê de alî hene. Serdestiyeke ji sedî sed a aliyekî nîn e û divê nebe', ew 3 şertên ji bo pêkanîna aştiyê rave dike: Şerta yekemîn a aştiyê ev e ku her kes bikaribe bi ewle bijî. Vê yeke tenê bi xweparastina civakan û karektera civakan a exlaqî û polîtîk dikare pêk were. Duyemîn, çênabe ku aliyekê serdest be. 'Kîjan alî (heq-neheq) dibe bila bibe, heke herdu alî bêyî serdest bibin (bi sîleh) rawestandina şer qebûl bikin, hingê aştî dikare bikeve rojevê.' Sêyemîn, ew e ku hemû alî di çareserkirina pirsgirêkê de ji xebat û saziyên demokratîk ên civakê re rêzê bigrin.

Têkoşîna jinan ji bo gihandina aştî, demokrasî û azadiyê têkoşîneke daîmî, civakî û siyasî ye. Ji bo serkeftina vê têkoşînê her dem rêxistinbûna xweser a jinan û helwesteke hevbeş a jinan pêwist e. Bi gelemperî ji bo gihandina çareserî û aştiyê bi hêzên dewletê re di warê têkoşîna jinan de sê qonax derdikevin pêş: Qonaxa yekemîn, têkoşîna ji bo gihandina pêvajoyên muzakere û misogerkirina nûnertiya vîna kolektîf a jinan di pêvajoyên nîqaşê, tevahiya komîsyon û mekanîzmayên biryardayînê de ye. Qonaxa duyemîn, têkoşîna ji bo bicihkirina daxwazên tevgerên azadiyê û jinan di peymanên aştiyê, biryar û zagonan de ye. Qonaxa sêyemîn, têkoşîna ji bo pêkanîna naverok û pîvanên di peymanên aştiyê de hatine îmzêkirin û bicihanîna gav û qanûnên pê ve girêdayî ye.

Rêber Apo carekî din bi pêvajoya 'Aştî û Civaka Demokratîk' ve rojev û pêngavên nû ji bo bi hêzkirina têkoşîna li ser bingeha kûrkirina hişmendiya azadiya jinan bipêşxist. Ji hevdîtina 23 Cotmeha 2024'an ve Rêbertî di nirxandinên xwe, di manîfestoya civaka demokratîk û peyama xwe ji bo Akademiya Jineolojiyê de girîngiyekî mezin daye dahûrandinên derbare dîrok, çand û azadiya jinan. Wî baweriya xwe bi hêza pêşengtiya tevgera jinê ji bo serxistina pêvajoyê aştî û civaka demokratîk dîsa anî ziman.

Di warî erkên entelektuel ên demê de yek ji xebatên serekî xebatên perwerdeyê ji bo bipêşxistina zêhniyeta demokratîk in. Mînak, lêkolîn û nîqaşên ji bo şênberkirina bersivên van pirsan xwedî wateyekî dîrokî û hemdemî ye: Wateya çanda dayika xwedawend di kesayeta jinê û rêûresmên civakî de çi ye? Taybetmendiyên civaka klana derdora jin-dayik çi ne û wateya van taybetmendiyan ji bo pêkanînên civaka demokratik a hemdemî çi ne? Pergala desthilatdariya mêr, şer û dewletê çawa û kengê pêk hat? Di encama çandên baviksalar wekî çanda qesrê, çanda Sati û çanda tecavuz çi zirar gihîştiye jin û civakê? Çanda jina azad çi ye û çawa pêşbikeve? Jin û mêr çawa dikarin bibin aydê xwe? Jiyana sosyalîst a komînal, têkiliyên malbata demokratîk û hevjiyana azad çawa pêk tên?

Lêgerîna hevbeş a hemû jinan ji bo bersivên heqîqî yên van pirsan wê ji bo serkeftina pêvajoyê diyarker bibe. Dîroka Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê jî dibe mînakek ku di kêliyên herî krîtîk de jin dikarin bi hevbeşiya raman, rih û têkoşînê ve hêz û enerjiya guhertina dîrokê raber bikin.

---



# Ji çiraxên hunera Kurdî

**Can Yûsiv**

Hunermend Delîl Mîrsaz

"Çemek ji awazan kû tucarî naçike û kaniyek ji helbestan kû teqez zuha nabe" Hunermend û helbestvanên kurd ên niştimanperwer ne tenê afirîner in,lê belê ew parastvanên nasname, ziman û kelepûrê ne û mertalê çanda kû berevaniya civakê dike ji pêlên qirkirina çandî û zimanî, ew hunerê dikin pirek kû paşerojê bi dema îroyîn û pêşerojê ve girêbidin, ew agirê bîranînê gur dikin û nahêlin qet vemire û barê ziman hildigirin li ser milên xwe û kelepûra Kurdî di dilê nifşan de diçînin, her straneke kû ew dibêjin û her helbestek kû ew dinivîsin, ew pirek e kû rojên berê bi îro ve girê dide û dengek e kû li dijî ba û bahozên hewil didin hebûna miletekî ji nexşerêya demê vemalin, ew afirînerên hêvîyê ne,xêzkvanên nasnameyê ne,huner dikin şûrek kû hebûna kurda ji tunebûnê diparêze û peyvê dikin ronahiyek kû riya wan ber bi mayîndebûna çandî ve ronî dike.

Di himbêza Efrîna berxwedêr de,ew bajarê kû bermayê mîrasa Mîtanî û Huriyan li hev kom kirî û li ser xaka wê ol û ayînan hev himbêz kirine ,çîrokek vejiya kû tucaran agirê wê venamire. Efrîn ne tenê bajarekî derbas bûye, lê ew hebûnek zindî ye kû dîrokê di rayên darzeytûnên kevnare de vedişêre û di her libeke zeytûnê de çîrokeke hezkirina sermedî di navbera xak û zarokên xwe de vedibêje û destaneke mayîn û rûmetê diafirîne ku ji hêla nifşan ve tê wergirtin. Ji zikê vê axa pîroz, hunermend û awazdanerê kurd Delîl Mîrsaz di 19ê Gulana sala 1966'an de li gundê "Eraba" yê gurêdayî navçeya Mabeta, ji dayîk û bavek kurd (Husên û Xedîce) hatiye dinyayê û di nav malbateke kurd a welatparêz û kedkar de, ku ji pênc bira û sê xwişkan pêk tê mezin bûye , ku evîna xakê, ziman û nasnameyê di dilên zarokên xwe de çandine û li ser rûhê Kurdayetî û Xweparêziyê perwerde kirine.

Delîl di himbêza Çiyayê Kurmênc de mezin bû,ew erdnîgariya kû bûye dergûşek bo şaristanan û lêvegereka dîrokê, navendek bo çand û hunera kurdî,stargehek bo azadîxwaz û şoreşgeran û çavkaniyek bo hunermend û stranbêjan, li wir hişmendiya wî ya hunerî pêk hat,di bin bandora dengên pêşengên stranbêjên kurd yên weke (Cemîl Horo-Elî Tico- Elî yê Kapê û Omer Cemlo..

...h.d ) yên kû nîşanên nasnameya yekemîn ya hunerî ya kurdî xêzkirin. Ji zarokiya xwe ve ew bi bavê xwe re tevlî civatên çêrokbêj û helbestan dibû û di nav wan de bê deng dirûnişt, Stran di cî de ezber dikirin û dubare dikir wekî kû bi hûrguliyên wan re jiyan dikir,li wir derîyên cîhana wî ya hunerî hatin vekirin û stranbêjî bû zimanê wî yê duyemîn û bû parastinkarê mirasê bav û kalan, ew di nav zevî û çiyayan de û di bin sîberên darên Hinar,Tû û Zeytûnan de û di navbera pêmayên keleha Nebî Horî,kevirên keleha Sem'an,deştên Basûtê û çavkaniyên avên Êndarê de mezin bû. Ew ji xumxuma sûlavên Meydankê û ji xuşîna çemê Efrînê fêrî stranbêjiyê bû, ji stranên şivanan li zozanan û ji lîlandina jinan di demên çinînê de wî despêkên xwe yên hunerê hûnandin , ji çavkaniyên xweşava wê vexwar da kû helbestên xwe vehûne û awazên xwe biafirîne, ji bênxweşiya mîrateya wê awazên xwe wergirtin,ji fîrefîra bayê çiyayên Lêlûn û Hawarê ew hînî jenîna Tembûrê bû, ji sura bayên zeviyên Pembû û Zeytûnan, ji pestînên pirpirîkên li ser rûçikên gulan wî gotinên xwe rêsandin.

Efrîn ew dibistana wî ya yekem bû, ji axa wê fêr bû wateya xweparêziyê û ji dîroka wê ya berxwedêr dersên dilsoziya xakê wergirt,ji keskîn û serweriya wê bawerî û israrbûna mayînê û hêz girt,ji bedewiya xwezaya wê awaz û helbestên xwe vehûnand û ji wê fêr bû kû huner ne tenê xemlek derbasdar e,lê bîranînek berxwedan û amûrekî ji bo mayînê ye.

Wî qonaxa seretayî li gundê xwe xwend, paşê malbata wî veguhezî şarê Helebê, ji ber zehmetiya rewşên jiyanê nekarî xwendina xwe bidomîne û bi wê temenê xwe yê bi çûk,dest bi pîşeya hesinkarî kir.

Li bajarê Helebê,bi tevlîbûna wî ji koma Agirî re di sala1988'an de,kiryara wî ya hunerî dest pê kir û taybetmendiyên kesayetiya wî ya afirînerî xuya bû. Hişmendiya wî ya hunerî hêdî hêdî bi beşdariya wî di ahengên neteweyî, helkeftên niştimanî û cejnên Newrozan de her çi li Efrînê, Helebê an jî li Lubnanê de, despêkir.

Tekoşîna wî bi koma Agirî re di navbera 1988 û 1992'an de domand, di wê demê de ne tenê weke endamekî komê tevdigerya,lê her weha wî karê rêveberiyê jî du salan erkdarî kir,vê yekê hêşt kû ezmûna rêxistinî ligel tecrûbeya xwe ya stranbêjiyê qezenc bike.

Di vê qonaxê de wî toreke fireh a têkiliyan û hevkariya bi komên hunerî yên cûda ên girêdayî bi şarê Helebê ve çêkir,wek komên li Helebê-Efrînê-Kobanî-Reqa, vê yekê kir kû hebûna wî di dîmena hunera Kurd de wekî pireka têkiliyan û nûnerê dengek komelî be kû derbirîna nasname û çanda gelê xwe bike.

Bi derbasbûna van salan re, Delîl bi domdarî hunera xwe pêşxist û asoyên xwe fireh kir,ew xebatên wî bûn lêvegerek ji bîranîna çandî ya kurdî re û çavkaniyek dewlemend ji bo her kesê kû dixwaze di deryaya afirandin û nasnameyê de avjeniyê bike.

Stran û muzîka wî êdî ne têne hema awaz bûn,lê bûn nivîsên zindî kû bênxweşiya dîrokê,qêrîna axê û nebeza civakê di xwe de hildigirin û nexşeyek hestyarî ya nasname û xweparêziyê diafirînin. Di sala 1992'an de, hunermend Delîl biryareke dîrokî girt bi tevlîbûna xwe li nav refên Tevgera Rizgariya Kurdistanê, ew ne tenê stranbêjek bû kû hema awaz û peyvê hildigire, lê bû kiryarek çandî kû di nav Herêma Kurdistanê de,di rêvebirina çalakiyên hunerî de cî digire,tenê piştî salekê (1993) di nav şarê Silêmaniyê de wî koma Mîzopotamyayê damezrand û ew yek ji endamên bingehîn yê damezrênerê navenda Mîzopotamya ya çandî bû, li wir fêrî zaravayê Soranî bû, dûv re gelek helbest bi wê zaravî nivîsî,paşê kirin melodî û strandin.

Sala 1996'an de xaleke girîng bû di kariyera wî ya hunerî de,wî rolek sereke lîst di fîlmê "Pangav" de û di heman salê de jî stranek bi navê "Hewar" bi zaravayê Soranî û bi kilîpê ve pêşkêş kir.

Di sala 2001an de, ew bû endamekî sereke yê koma Şehîd Sîpan li Çiyayên Qendîlê,berî kû tevlî komê Awazê Cîya bibe bi deng û tecrûbeya xwe li wê zêde bike, paşê di sala 2002'an de ew derbasî Ermenistanê bû û li wir koma Şehîd Berçem damezrand ,piştî wê bi du sala (2004) ew beşdarî damezrandina navenda çandî ya "Dîcle" li Bexdayê bû û li wir ,wî xebatek awarte bi navê "Etyaf Iraqîyê" pêşkêş kir.

Wî di stranekê de,bi vîdyo klîpekî, zimanên cuda yên Iraqê kom kir,da kû huner bike pirek di navbera nasnameyên pirreng de.

Di sala 2005'an de albûmê wî "Dengên Winda" li Silêmaniyê derket, paşê di navbera 2007 û 2010'an de wî rêveberiya şaxê Navenda "Dîcle" li Kerkûkê kir,kû li wir jî karên xwe domand da kû huner bi rastiya civakî û siyasî ve bide girêdan.

Di sala 2010 de,ew derbasî Rojhilatê Kurdistanê bû, ew bû endamek yê Navenda çandî ya "Bestûn" û li wir koma Rojyar damezrand,ku bû dengê çiyayên rojhilat û peyama domandina hunerî ya wê deverê.

Di sala 2013'an û piştî bîst û yek sala ew vegeriya Rojavayê Kurdistanê û bi koma Cûdî re li bajarê Dêrikê xebitî,li wir gelek xebatên cûrbecûr pêşkêş kir,di nav de stran,kilîpên muzîkî û berhemên taybet ji bo zarokan jî hebûn.

Piştî wê dû salan (2015) ew çû Qamişlo,li wir bi komên Botan û Sazkar re kar kir û di heman demê de beşdarî Fîlmê "Mako Sare" bû .

Di sala 2016'ê de vegeriya bajarê dayikbûna xwe Efrînê,li wir bi koma Çiyayê Kurmanc re xebitî û li wir berhemên weke (serkeftin) û (rojawa) û gelekên din bi koma çiyayê kurmênc re tomar kir.

Piştî wê, di sala 2018'ê de, ew tevlî Navenda Hunergeha Welat bû, û heta îro jî endamtiya wê dike.

Wî bi xwe re zanistên xebata hunerî ya çendî salan kû girêdayî bi têkoşîn, nasname û bîranîna kolektîf a Kurdan hilgirtibû derbasî vê herêmê kir. Hinêra wî tenê bi stranbêjî û sazvaniyê sînordar nema,lê gihişte awazdêneriyê wî gelek awaz afirandin

û ruhekî nû da kelepûra muzîka kurdî û karî cihê xwe wek yek ji navdarên awazdênerên muzîka kurdî ya nûjen de bigire,wî di dirêjahiya kiryara xwe ya stranbêjiyê de,mîrasek dewlemend kû heya niha 113 stran ji peyv û awazên xwe pêşkêşkir,kû karî piran di navbera dema paşeroj û îroyîn de ava bike.



Ji stranên wî yên navdar :

- Mamostê Mezin
- Kezyên Sor
- Keskesor
- Rabin
- Serkeftin

Û wî zêdetirî ji 70 vîdyo kilîbên stranbêjiyê pêşkêş kir kû pê pirtûkxaneya hunerê ya Kurdî bi riya stranên xwe û muzîka xwe ya afirîner dewlemend kir,kû tê de helbest bi muzîka kurdî re tevlihev kir û ji kilîpên wî yên herî navdar kû ji gotin û awazên wî:

- Efrîna min
- Wijdan
- Dehola Rojava
- Rojawa - Soranî
- Rêwîyên Rûmetê.

Wî têcrubeya stranbêjiya duetan û hevbeş bi gelek hunermendên Kurd û komên hunerî yên Kurdî re li darxist wekî: "Hozan Serhed, Tirîfe Xidir, Bêrîvan Hiso, Hesen Dêrikî, Hêvî Cûdî, Roza, Sumiya Serê Kaniya, Koma Cûdî, Koma Botan û Koma Agirî ... hwd."

Li kêleka stranbêjî û awazdêneriyê hunermend Delîl di meydana wêjeyê ya Kurdî de jî hebûneke taybet heye, kû xebata wî ne tenê bi deng û awaz re tê sinor kirin,lê her weha derbasî xêzkirina peyvêjî dibe kû girîngiya wê ne kêmtirî ji afrîneriya wî ya muzîkî re ye, wî helbestên klasîk ên terazû bi rêzbend û kêşe heya bigihîje çîrok û romanan bi şêwazek bedew nivîsandin. Wî sê pirtûk bi zimanê kurdî weşandin kû bûne stasyonên navdar di rêwîtiya wî de,kurteya tecrûbeya wî û dîtina wî ya mirovahî dest nîşan didin:

- Keskesor -Helbest
- Dilopek ji ava Feratê -Roman
- Ezîz ê Tek Mistefa - Çîrok

Her wiha dîwaneka wî ya helbestan li ber çapê ye.

Hunermend Delîl ne tenê hunermendek an jî awazdênerek an nivîskarek e, lê ew dibistanek hunerî û torevanî ya tevahî ye kû çavkaniyên wê yên zelal gelek nifşên hunermendan jê vexarine û hîn jî di bilindahiya dayîn û afirîneriya xwe de ye. Ew çemek e kû ava wê qet namiçiqe û çiraxek e ronahiya wê qet venamire, rêyên hunerê ronî dike û dibe çavkaniya hêvî û hestyarî ji bo her kesê kû ji hunera wî vedixwe û ji mîrasê wî yê dewlemend û afirîneriya wî ya nûvekar firşk dibe û ew hêvî û jiyanê di dilê nifşên pêşerojê de diçîne,tekez dike kû hunermendê rastîn ne ew e kû tenê navê xwe di tabloyên navdar de tomar dike, lê ewe kû huner û nasnameyê di dilên demê de mayînde bike.

---



## Krîza vegêranê, dizîna bêdengiyê

**Remezan Olçen**

Heftiya bihurî nivîsa me li ser giringiya manîfestoyeke nû ya çand û hunerê bû. Ez dixwazim vê care jî li ser vê meselê binivîsim. Lê ji hêleke din ve. Çima pêdivî bi manîfestoyeke nê heye? Îro roj herkes mutabiq e ku tehma demên berê nemaye. Ev ne ji ber nostaljiyê wisa ye. Erê ew jî heye lê mesele jê kûrtir e. Em di demekî nû de ne. Serdema dijîtal. Têkilî naylon û dîjîtal bûne. Ziman guherî ye û dem li gorî dewrên berê zûtir diherike, Bala me jî wisa ye. Hiş û mêjî, hest û dil êdî weke berê nikakarin dema tê de ne îdraq bikin.

Kambaxiya serdema dîtal jî ev e û qurbanî jî dema bêdengiya ji me tê dizîn e. Dîjîtalîzm bir bi hostatî û bêdeng weke marekî hat li nîveka jiyana me konê xwe vegirt; vegotin û vegêranê ji me dizî. Çîrok û hîkayet, êdî ne ew çîrok û hîkayetin ku bîranîn, kombûn, an wate tê de vedihewin û krîstalîze dibin. Naxûr û mixabin êdî çîrok bermahiyek e ku di herikîna daneyên dîjîtal a bênavber de dihele, ji çavkaniya xwe veqetandî ye. Vegotin û vegêran, odeyek dengvedanê bû, ku têkiliya hundurîn a mirov bi cîhanê re çêdikir Me bi rêya vegêrana bi hostatî bi jiyanî re têdikî datanî. Lê îro ev têkilî bûye têkiliyeke dîjîtal.

Dîjîtalîzm zimanê xwe jî çêkiriye. Peyvên me ji me didize, zimanê xwe dixe devê me, şêweyekî nû ya jiyanê (!) li me ferz dike. Di vî serdemê de mirov êdî jiyanê venagêrin, jiyanê dimezêxin, dixwin, diqedînin. Hezkirin êdî ne hest e ew di serî tilîka de tikandina ecibandin yan jî necibandin e. Gotin ji tedawulê radibe li şûna wê mirov vedigerin serdema axaftina bi îşaretan. Lê ev îşaret jî guherîne. Mirob li nav çavê hev nanêrin li ekraran dinêrin û îşaretan ji hev re dikin. Ev îşaret hukmê li ser derûniya mirovî dike.

Mirov îro neaxive, venagêre, dixwe. Erê jiyanê dixwe. Tiştê ku ew dixwe êdî ne wate ye, lê tenê teşwîq e. Rêzeya teşwîqên ku bi berdewamî têne nûkirin, xwezaya vegotinê ne mumkin dike. Ji ber ku vegotin baldariyê, li bendêbûnê û hêdîbûna bîranînê dixwaze. Lêbelê, dîjîtalîzm hebûnek lezê dixweze, ew çav û dîtinî teşwîqî lezê dike. Wisa lez dibînî ku di mêjî û dil de berî reaksiyonekê dîmeneke nû tê. Sebra di kêraniya demê de vî demî nemaye. Mirov heta her tiştî bi lez dixwazin. Dixwaze bibîne û derbas bibe. Îcar di vî demî de ji ber wê giringî bi manîfestoyeke nû ya çand û hunerê heye ku hem vegêranê li jiyana me vegerînin hem jî bi hêza gotina xwe îdraqa me ya li jiyanê kêr û bi mane bikin.

# ‘Em ji aliyê ruh û mejî ve girêdayî Rêber Apo ne’

Endama Kordînasyona Meclisa Îştar Qîmet Neraxî diyar kir ku gelê Mexmûrê ji 20`ê Tîrmeha 2023`an de ji bo misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo çalakiyên xwe didomînin û wiha got, “Heta Rêber Apo azad nebe, wê çalakiyên me bidomin, em ji aliyê rih û mejî xwe ve girêdayî Rêber Apo ne.”

**Birûc Resûl/Mexmûr**

Şêniyên Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî ya Mexmûrê ji bo şikandina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 20 Tîrmeha 2023’an de çalakiya Nobetê dabûn destpêkirin. Ev çalakî bi biryardariyek xurt, bi awayê dorveger ango her pênc rojan carekê bi komek nû re didome. Di vê çarçoveyê de Endama Kordinasyona Meclîsa Îştar ya Wargeha Mexmûrê Qîmet Neraxî ji Rojnameya me re axivî.

**‘Nobetên gireva birçîbûnê yên dem kurt û dem dirêj hatine destpêkirin’**

Qîmet Neraxî da diyar kirk u ev nêzî 27 sal in ku dewletên navnetewî komplo li ser Rêber Abdullah Ocalan pêk anîn û radestî dagirkeriya tirkiyê kirin û dîl hat girtin wiha doman: “Wek tê zanîn ku komploye 1999`an li ser Rêber Apo hat pêkanîn, bi destê hemî dewletên hegmon û navnetewî bû, her wiha ev dewlet jî Rêber Apo radestî dewleta Tirk a dagirker kir. Ev nêzî 27 sal in ku Rêber Apo di nava tecrîdeke giran re derbas dibe. Ji roja dîlgirtina Rêber Apo ve û heya roja îro, gelên kurd, dostên kurdan bi çalakiyên cur bi cur ve destpêkirin, bêguman mirov dema ji xwe re bi awayekî berferh li cîhanê binêre, wê bibîne ku ne tenê gelê Kurd Azadiya Rêber Apo ya fîzîkî dixwazin, her kes niha li ser piyane û daxwaze azadiya Rêber Apo ya fîzîkî dikin. Ev sekina gelan dide xuyakirin ku fikir û felsefeya Rêber Apo ji bo tevahî pirsgirêkan çareseriye. Her wiha Wargeha Mexmûrê ji bo azadiya Rêber Apo ya mesoger bikin, di 20`ê Tîrmeha 2023`an de dest bi çalakiyên cur bi cur kirin,. Mîna daxuyaniyan, meşan û kombûnên cuda tên li darxistin, di heman demê de nobetên gireva birçîbûnê yên dem kurt û dem dirêj hatine destpêkirin.”

**‘Rêber Apo ji bo tevahî gelên bindest wekî ronahiyekê ye’**

Qîmet di berdewamiya axaftina xwe de wiha anî ziman: “Çalakiyên Nobetê yê Wargeha Mexmûrê ji aliyê gel ve bi awayekî aktîv tevlî dibin, çalakiyên me hem wekî giştî wargeh tên pêk anîn hem jî wekî xweser tên li darxistin, bi giştî nêzîkatiyeke erênî heya. Gelê me heya astekî bilind bi rêber Apo ve hatiye girêdan, em bawerin ku tu kes nikare me ji Rêber Apo qut bike, ji ber roj bi roj em xwe bi fikir û felsefeya wî kur û perwerde dikin, Em wek gelê Kurd êdî tu tehmûla me li dijî tecrîda li ser Rêber Apo nema ye. Em ji aliyê rih û mejî ve girêdayî Rêber Apo ne. pêwîst e azadiya Rêber Apo ya fîzîkî û mafê hêviyê jêre were dayin. Bêguman çalakiya me ji bo şikandina tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo ye. Ji bo şikandina vê tecrîdê divê her Kurdek li ku derê dibe bila bibe, pewîst e her tim di nava tevgerê de bin û tişta ji destê wan bê pêk bînin. Ji ber ku Rêber Apo ne tenê ji bo gelê Kurd, lê belê ji bo tevahî gelên bindest wekî ronahiyekê ye. Li ser vî bingehî divê gelê Kurd û tevahî gelên cîhanê yên demokrat destê xwe bidin hev ku em bikaribin azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk bînin.”

**‘Heta Rêber Apo azad nebe, wê çalakiyên me bidomin’**

Endama Kordinasyona Meclîsa Îştarya Wargeha Memûrê Qîmet Neraxî di dawiya axaftina xwe de tekez kirk y heta azadiya Rêber Apo nebe ew ê Çalakiyên xwe



bidomînin û wiha pê de çû: “Dayik û ciwanên me bi dengê xwe çalakiyê dewlementir kirin. Jin bi tevlîbûn û nîqaşên xwe reng didin çalakiyê. Fikir û felsefeya Rêber Apo ji bi tevahê gelan xwedî cihek girîng e. Bi saya Rêber Apo gelê Kurd maf, nasname û xwe naskirin. Divê hemû sazî û dezgehên navneteweyî, ji bo azadiya Rêberê Abdullah Ocalan, zextê li ser dewleta Tirk bikin. Dibêjin em welatên demokrastî, wekhevî û edaletê ne û wiha ye her tiştî ji xwe didin destpêkirin, lewma divê xwedî li erk û berpirsyariyên xwe derbikevin. Me di 20`ê Tîrmeha 2023`an de ji bo misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo çalakiyên xwe didomînin. Ji ber vê yekê Heta ku Rêber Apo azad nebe, wê çalakiyên me bidomin û ser ne tewînin.”



## Çareserî an tevlîhevî

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Li jiyanê her gav tişt diqewimin. Ji ber jiyan bi xwe re pirsgirêkan diafirîne. Weke, ajal dar û gîya jî di jiyanê dene û ew jî ji bo karibin bijîn li çareseriyan digerin. Ji bo berdewamiya jiyanê divê tekoşînê bidin û jiyanê heq bikin. Di sîstema gerdunê de herikandinek heye û ev herikandin li ser lihevkirinê dimeşe.
Bi gotinekî din henek tişt bi hev re hevdu temam dikin û henekî jî dijberiya hevdu dikin.
Gelekî cîhên Qur’ana pîroz de ev afirandin weha tê vegotin:
„Û me her tişt cot afirand. Hêvî heye ku hûn şîretan bigrin û bi hizirin.“ (Zariyat 49)
Weke Mînak: Nêr û Mê, Şev û Roj, Sipî û Reş, Baş û Xirab. Hêlekî din jiyan û Mirin, Av û Agir.
Weke Nêr û mê hevdu temam dikin lê mirin jiyanê bi dawî dike.
Jiyana mirovahî li gor baweriyan pîroz e, lê ji bo beşer bibe mirov divê xwe biguherîne û bigîhîje asta mirovahiyê. Ger weke hebûn mirov hebejî û xwe negîhîjîne asta mirovahiyê, divê weke beşer were binavkirin.
Lewre mirovbûn astekî ye!
Ola Îslamê ji bo çareserî pêşkeve, pêşniyaran dike û bang li mirovan dike, da ku li ser çareseriyan bi hizirin.
Mixabin di cîhana Îslamî de çareseriya pirsgirêkan naye giftûgokirin û li ser tunnekirinan kar tê meşandin. Ev nêzikbûn pirsgirêkan kurtir dike.
Pirsgirêkên desthelatdariyê bi têkçûnan dawî dibin. Flistînî ev çend deh salin dibêjin em ê Îsraîlê tunne bikin û em ê tu caran Îsraîlîyan qebûl nekin. Aliyekî ji cuhiyan jî heye dibêjin, em Fîlîstîniyan tunne bikin.
Pirsgirêka me bi dewlet û milletên herêmê re jî ser heman şêwazî dimeşe. Ne Tirk, ne Îran, Ne Esedê berê û Şara, ne jî Iraqa ku hêza wê nîne, ser tunnekirina millet bîr û baweriyên dihizirin û kar dikin.
Ma gelo weke mirovan çareserî ne mumkin e?
Ger mirov berê xwe bide polîtikayên şaş ên dewletên herêmê, mirov yekser tevlîhevîyan dibîne, ne çareseriyan.
Polîtikayên tevlîhevîyê bûne exlaq!
Birêvebirên Rojhelata Navîn nizanin pirsgirêkên xwe bi şêwazekî aştiyane an bi hevdîtinan çareser bikin. Tundî-tujî û tunne kirin buye weke Amentuya wanan û xwe tekrar dikin.
Ger mirov bi baldarî li tekoşîna gelê Kurd mêze bike, mirov yekser di nêzîkbûna wan de cudabûnekî dibîne. Bi taybet serokê gelê Kurd birêz Abdullah Ocalan weke Rêber xwedan rêbazên cuda ye. Ev zîdetirî 33 salan e li çareseriyêk aştiyane digere. Lê sîstemên dagirker ên welatê me, weke rêya yekan e îmha û înkarê de israr dikin. Ev sed sal zêdetire, pirsgirêka me xwe nû dike û tekarar dike.
Divê pirsgirêk bi danûsandinan werin çareserkirin, ne bi kuştin û malwêraniyan hertim xwe tekarar bikin.
Ji 27 Sibatê vir de, eniya Kurd ji bo ev pirsgirêk were çareser kirin gavên dîrokî pêşdixe. Lê mixabin bi taybet dewleta Tirk û desthelata AKP ê dixwaze tevlîheviyê berdewam bin.
Heman tiştê liser Ahmet Al Şara jî ferz dikin û evjî bi xwe re çareseriyê çênake.
Divê Kurd ji bo çareseriyan serê xwe zêdetir bi êşînin û tevlîhevîyan kêm bikin.
Balkêşe kesên di eniya Kurdan de xwe didin nîşandan jî daxwaza tevlîheviyê dikin. Divê were pirskirin: hûn ji bo kîjan çareseriyê xwedan gotin û kar û barin?
Ji bo mirov li nirxên mirovahî vegere, divê herdem ji bo çareseriyan serê xwe bi êşîne.
Tevlîhevî ne taybetmendiyekî mirovîye, lêger û dîtina çareseriyan erk û taybetmendiyên mirovî ne.
Divê em derveyî şer jî rêbazan ava bikin, kesên şer weke rêbaz bikar anîn, neha jî Aşitî weke rêbaza sereke pêş dixin. Yên dîtir tenê aliyê tevlîhevîyê ne.

# Hêviya vegera Efrînê her zindiye

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Koçberên ji bajarê Efrînê diyar kirin ku hêviya vegera Efrînê di dilê wan de her zindî ye û ew ê hertim ji bo vê hêviyê heta ku koçberî bi dawî bibe li ber xwe bidin.**

Dewleta Tirk a dagirker di sala 2018’an de Efrîn dagir kir û dest danî ser mal û milkên welatiyan, lewma welatî neçar man koçber bibin û berê xwe bidin Şehba û 7 salan di kamban de li ber xwe dan da ku vegerin cih û warên xwe. Lê di sala 2024’an de çeteyan êrişî Şehba kirin û şêniyên Efrînê careke din koçber bûn û berê xwe dan herêmên bi ewle yên Rêveberiya Xweser.
Di derbarê Rewşa koçberiyê de û zehmetiyên ku tên dîtin koçberên ji bajarê Efrînê Mistefa Hisên û Ebdurehman Hisên ji Rojnameya me re axivîn.

**‘Jiyana di dibistanan de nayê tehemulkirin’**

Koçberê ji bajarê Efrînê Mistefa Hisên anî ziman ku ev nêzî salekê ye ew hatine bajarê Dêrikê û di dibistanan de bicih dibin û wiha got: “Dema Efrîn hat dagirkirin em neçar man koçber bibin û berê xwe bidin Şehba, me 7 salan li Şehba li ber xwe da. Her roj me xeyal dikir ku em ê nêzîktirîn dem de vegerin warên xwe. Lê mixabin çeteyan bi ser Şehba de jî girtin em neçar man ji wir jî bar bikin, heya roja îro reva me ji nav destên çeteyan wek xewnekê li ber çavên me ye, di reva me de ji ber serma zêde zarokan jiyana xwe ji dest dan û gelek kesan bi destê xwe jiyana xwe bidawî kirin, da ku nekevin di nav destê çeteyan de. Dema me ji Şehba bar kir em hatin Tebqa û ji Tebqa me berê xwe da bajarê Dêrikê. Raste him Rêveberiya Xweser him jî welatiyan destek dan me û pêdiviyên me pêk



Mistefa Hisên

anîn, lê jiyana di dibistanan de ne çareseriyê, li tu welatî nehatiye dîtin ku malbat di dibistanan de bijîn, di havînan de ji ber germa zêde zarokên me bi nexweşiyan diketin, niha jî em ber bi zivistanê ve diçin rewş xirabtir dibe, heya niha pêdiviyên zivistanê ji me re nehatine. Tevî hemû astengiyên ku em têre derbas bûyîn jî me xwe li ser piyan girtiye, lê zarokên me wê rewşa wan çi be kes nizane.”

**‘Dagirkeriyê zarokatiya zarokan ji wan dizî’**

Koçberê ji bajarê Efrînê Ebdurehman Hisên jî wiha got: “Ji ber êrişên



Ebdilrehman Hisên

çeteyan li ser Şehba em neçar man piştî 7 salan ji koçberiyê careke din koçber bibin. Zarokên temen piçûk bi me re gelek in her cara ku koçberî çêdibe wekî ew zarok tên cezakirin. Sberoja wan winda bûye, vê koçberiyê zarokatiya wan ji wan dizî. Gelek pêdiviyên zarokan hene em nikarin pêk bînin ew ji hemû xwestekên xwe tên mehrûmkirin. Ev nêzî salekê ye ku em di didibstanekê de dijîn û rojane zarokên me bi nexweşiyan dikevin, niha jî em ber bi zivistanê ve diçin û dibistan gelekî sar in. Hêvîdarim nêzîktirîn dem em herin bajarê xwe û li ser axa xwe.”



# Diyalogên di navbera Îmraliyê û Tirkiyê de...(2)

Bi banga dîrokî ya Rêber Apo ku di 27’ê Sibatê de kiribû, dengvedanek li Rojhilata Navîn û Cîhanê kir. Dewleta Tirk ya ku hebûna Tevgera Azadiyê û gelê Kurd tune dihesiband û êrîşên qirkirinê pêk dianî, di 1’ê Cotmeha 2024’an de bi silavdayîna serokê MHP’ê Dewlet Bahçelî bi koma Partiya DEM’ê re pêvajo derbasî qonaxeke dîrokî bû.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Di 27ê Sibata 2025an de şandeya ku ji Ahmet Turk, Pervin Buldan, Sirri Sureyya Onder, Tulay Hatimogulları, Tuncer Bakirhan, Cengiz Çiçek û Faik Ozgur Erol pêk dihat çûn Îmraliyê û bi Rêber Apo re hevdîtin kirin. Şandeya DEM Partiyê, Banga Aştî û Civaka Demokratîk ku Rêberê Apo û girtiyên li Îmraliyê bi hevre aşkere kirin, li Stenbolê li pêş sedan rojnameger, qanalên TV û rojnameyên navdewletî bi raya giştî ya cîhanê re parve kirin. Rêber Apo di bangê de aşkere kir ku bang li PKKê dike ku xwe fesix bike û dawî li şerê çekdarî bîne.
Di 28ê Sibata 2025an de Seroke MHPê Dewlet Bahçelî têkildarî bangê daxuyanî da û destnîşan kir ku daxuyanî muhîm û bi qîmet e. Heman rojê de Serokê CHPê Ozgur Ozel, anî ziman ku muzakereya di navbera hikûmet û Îmraliyê de zêdeyî salekê ye didome.
Di 1ê Adarê de 2025an PKKê li ser banga Rêber Apo agirbesta yek alî îlan kir.

**“Jin ne ji zayinê ye ji hebûnê ye”**

Rêber Apo nameyek ji bo jinan di 8 Adarê de şand û di nameyê de wiha got: “Vejîna ku wê ji nû ve pêk bê gelek girîng e. Divê jin ne di warê biyolojîk de, divê di warê çand, civakî û dîrokî de bê nirxandin. Wekî ku Simone De Beauvoir jî dibêje; jin ne ji zayînê ye, ji hebûnê ye. Ez ne dijberê evin û zewacê me. Lê, her roj li ser navê evînê cînayetên gelek hov pêk tên. Kesekî evîndar çawa evîna xwe dikuje? Ev ne evîn e. Heya niha gelek jin ji ber pêwendiya bi vî rengî întîxar kirin. Her wiha, çanda azad a jinê heye. Asta ku hatî hûn nêzî vê çandê ne. Jin hewl didin derkevin derveyî sînorên dayikbûyîn û hevjînbûyînê. Lê, hêj jî hûn encax ji sedî 10’ê çanda azad a jinê îdare dikin. A esas ew e ku, divê bi ferasetê şer bê kirin. Pergala civakî ya mêrên serdest her tim ji bo jinan pirsgirêkan diafirîne. Tundî heye, dagirkerî heye, ensestî heye, destdirêjiya zayendî heye, îxtîmala kuştina zarokên keç heye. Di pêşerojê de zarok bên kuştin hûn ê çi bikin? Dema ez behsa çanda Satî dikim, ez balê dikşînim ser vê rastiyê. Divê hûn bi vê çand û ferasetê re şer bikin. Di vî warî de kêmasî û nakokiyên we hene, xwe ji van kêmasî û nakokiyan rizgar bikin.”



**Hevdîtinin hatine çêkirin**

Di 10-17ê Adara 2025 an de, :DEM Partiyê li ser banga Rêber Apo bi partiyên siyasî re hevdîtin kir.
Di 12ê Adara 2025an de Erdogan diyar kir ku eger ji Şandeya DEM Partiyê ya Îmraliyê daxwaz biçe dikare bi şandeyê re hevdîtin bike. Li ser vê yekê Şandeya DEM Partiyê randevû ji Tayyip Erdogan xwest.
Di 14ê Adara 2025an de Hevserokê KCKê Cemil Bayik, anî ziman piştgiriyê didin banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û banga wî esas digirin. Lê ku operasyon bidome ev yek dê ne pêkan e.
Di 20ê Adara 2025an Serokê MHPê Devlet Bahçeli xwest PKK di 4ê Gulanê de kongreya xwe li navçeya Malazgîrtê ya Mûşê pêk bîne.
Di 10ê Nîsana 2025an Serokkomar Tayyip Erdogan şandeya DEM Partiyê ya îmraliyê qebûl kir. Û hevdîtin pêkanîn.
Di 21ê Nîsana 2025an de Şandeya DEM Partiyê ya Îmraliyê cara çaremîn çû Îmraliyê û bi Rêber Apo re hevdîtin kir. Parêzer Faîk Ozgur Erol jî vê carê çû îmraliyê.
Di 3e Gulana 2025an de endamê Şandeya DEM Partiyê yê Îmraliyê Sirri Sureyya Onder li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da.
Di 9’ê Gulanê de PKKê aşkere kir ku di 5-7ê Gulanê de kongre pêk anîye.
Di 12ê Gulana 2025’an de PKK’ê encama 12’emîn kongreya xwe aşkere kir. Diyar kir ku li ser banga Rêber Apo di 5-7ê Gulanê de li du qadên cuda kongre pêk anîye û biryara fesixkirina PKKê û berdana çekan dan.
Di 27ê Gulana 2025an de Şandeya DEM Partiyê li meclisê Dewlet Bahçelî ziyaret kir.
Di 24ê Hezîranê de Serokê Meclisê Numan Kurtulmuş, têkildarî komîsyona ku hat plankirin bê avakirin, li meclisê axivî. Bi wekîlên komên partiyên siyasî re hevdîtin kir.
Di navbera 1 û 30ê Tîrmehê de li ser banga Rêber Apo pêşengiya TJA, DBP û DEM Partiyê de li sedan navendan herî kêm 2 hezar civînên gel hatin plankirin û lidarxistin.
Di 6’ê Tîrmeha 2025an de şandeya DEM Partiyê dîsa çû Îmraliyê û bi Rêber Apo re hevdîtin kir.
Di 7ê Tîrmeha 2025an de Şandeya DEM Partiyê ya Îmraliyê Serokkomar Erdogan ziyaret kir.
Di 9ê Tîrmeha 2025an de Rêber Apo daxuyaniyek bi dîmen da û di nava civakê de bandorek da çêkirin. Rêber Apo di dîmên de jî bal dikêşe ser fesix kirina PKK’ê rawestandina şerê çekdarî.
Di 11ê Tîrmeha 2025an de Koma gerîla ya ku ji 30 şervanê pêk dihat, bi pêşengtiya Hevseroka Konseya Rêveber a KCK’ê Besê Hozat, bi merasîmekê ku gelek sazî û dezgehên sivîl jî beşdar bûbûn de, li Şikefta Casenê ya gundê Surdaş a Dukanê ya bi ser Silêmaniyeyê dikeve çekên xwe şewitandin.
5ê Tebaxa 2025an de partiyên ku komên wan di Meclisê de hene Komîsyona Meclisê ava kirin. Komîsyona Demokrasî, Xwişk-Biratî û Hevgirtina Netewî, heta niha 15 civîn pêk anîn. Di civînan de li nûnerên saziyên civakî û rêxistinên demokratîk guhdar kir.
Di 20ê Tebaxê de Komîsyona Meclisê destûr neda ku Dayikên Aştiyê li salona civinê bi Kurdî biaxivin. Ev bû sedema bertekên gel.
Di 22ê Tebaxê de Meclîsa Dayîkên Aştiyê ya Amedê têkildarî civîna bi komîsyonê re daxuyanî dan. Dayîka Aştiyê Nezahat Teke diyar kir ku ew tenê mafê zimanê xwe dixwazin û got: “Divê Rêber Apo were meclisê.”
Di 8ê Îlone de Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo civaka Êzidî peyamek şand û got: “Ez ê dest ji hesabpirsîna kesên komkujiya dawî pêk anîne bernedim.”

**Stûna bingehîn a tekoşînê Mexmûr**

Rêber Apo ji bo gelê Mexmûrê peyam şand û di pêyamê de wiha got”Di nameyê de wiha hat gotin: “Ez di wê baweriyê de me, gelê me yê Mexmûrê çawa ku berê bû stûna bingehîn a têkoşîna me, di pêvajoya avakirina Aştî û Civaka Demokratîk de jî wê bibe xwediyê heman rol û misyona girîng. Wekî hêza dînamîk a vê pêvajoyê, bûyîna xwedî berpirsyarî û pêşengtî kirin, pêwîstiya mîrasa wan a têkoşînê ye. Xaleka hevdîtînên me jî li ser rewşa gelê me yê Mexmûrê ye. Bêguman bi pêşketina pêvajoyê re vegera wan a ser xaka xwe wê çêbibe. Lê belê pêwîste were zanîn ku, divê nêzîkatiyên ferdî û malbatî dernekevin pêş. Em ê meseleyên civakî, siyasî û hiqûqî bi awayek kolektîf bigirin dest û li ser vî esasî ber bi çareseriyê ve biçin. Der barê yên Mexmûr, yên Ewropa û tevahî yên penabertiyê de wiha difikirim: Vegera hemûyan wê kolektîf be û erdnîgariyê em ê hilbijêrin. Dixwazin vegerin? Em wisa hesab bikin ku nîv bi nîv dixwazin vegerin. Divê em vegerê kolektîf bifikirin. Di vê çarçoveyê de silavên min li Mexmûrê bikin. Li ser vî esasî di serî de jin û ciwan silavên xwe û hezkirinên xwe yên kûr û bêdawî ji tevahî gelê Mexmûrê re dişînim
Rêber Apo peyamek ji Heyeta Ewropî re şand ku dixwaze pê re hevdîtinê bike û got: “Hêvî dikim ku di atmosfereke welê de ku civaka demokratîk bê avakirin, em rû bi rû hevdu bibînin.”
Rêber Apo di 30 îlonê de peyameke nû ji civaka êzidî re şand. `Ez ne Êzîdî me lê ez xem xwar û dilsozê vê civakê me’
Meşa ku ji hêla TJA yê ve bi dirûşmeya “Em bi hêvî ber bi azadiyê ve dimeşin” di 1’ê Cotmehê de li Amed dest pê kir û dê di 7’ê Cotmehê de li Parlamentoya Enqerê bi dawî bû. Gotin ku” Armanca me ya sereke ew e ku mafê hêviyê yê Rêber were naskirin û azadiya wî ya fîzîkî were bidestxistin.”
17 Cotmeha 2025’Serokê Meclîsê û Serokê Komîsyona Demokrasî, Xwîşk-Bratî û Hevgirgtina Netewî Numan Kurtulmuş ji bo hin rêze hevdîtinan derbasê Amedê bû. Numan Kurtulmuş ewilî li Zanîngeha Dîcleyê tev li merasîma sala akademîk bû û li vir axivî. Kurtulmuş di axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya zimanan û di dawiya axaftina xwe de risteyek helbestek Kurdî xwend,
Buroya Hiqûqê ya Sedsalê têkildarî serdana 13’ê Cotmeha 2025’an a li Îmraliyê, ku bi Rêber Apo û girtiyên din re hevdîtin kir, daxuyaniyek weşand. Rêber Apo got “Pîvana hêviyê gaveke ku divê dewlet biavêje. Divê vê bagajê rake. Ev yek meseleyeke ku bandorê li hezaran mirovî dike. Bi çi rengî dinirxîne binirxîne divê ev yek bê rakirin. Ji aliyê hiqûqî ve divê ev bê kirin.”

**Nameya Rêber Apo ji bo Daykên Aştiyê**

Meclisa Dayikên Aştiyê, piştî 12 salan bi dirûşmeya “Dayîk pêşengên civaka demokratîk û aşîtîyek mayînde ne” ku 18-19 Cotmehê li Amedê li darxistin Rêber Apo nameyek ji bo dayikan şand û di nameya xwede wiha dibêje “Ez herî zêde ji dayika xwe rastiya jiyanê, sebrê hîn bûm, lê herî zêde jî sekna rast ya serbilind. Ez, dayikên aşitiyê ku xwediyê vê sekna serbilind û rûmet in silav dikim û ji bo konferansa we serkeftinê dixwazim. Jin çawa bixwaze divê wiha bijî, lê divê cesareta wan ya ji bo jiyaneke azad jî hebe. Min rêzgirtina xwe ya ji bo jinan li ser rêgeza ‘divê azadî bi ramanê dest pê bike’ ava kiriye. Hûn wek dayikên aştiyê yên ku parastina jiyanê û berxwedana aştiyê di qadên herî pêş de dikin, her wext di tekoşîna azadî û aştiya me de di qadên herî pêş de cih girtiye. Helbet wek dayîk cihên we di têkoşîna me de bênîqaş e. Lê belê, ez di vê baweriyê de me ku divê ew qalibên jinbûn û dayikbûnê ku civaka kevneşopî ferz dike bên bin şikandin. Hûn divê li rex nasnameya xwe ya dayîkbûnê di heman demê de bi nasnameya jina azad bi hişmendiya xwe re têbikoşin. Ev erdnîgariya ku yekem car civaka dayiksalar lê derketiye di heman demê de cihê nakokî û pirsgirêkên civakî yê yekem e. Kolekirina jinê û kolekirina civakê bi hev re dimeşe. Berevajiyê fikra ku tê zanîn kolebûn ne bi derketina dewletbûnê, lê bi kolekirina jinan dest pê kiriye.

**Ji Tevgera Azadiyê gaveke din a dîrokî**

Di 26 Cotmehê de, Rêveberiya Tevgera Azadiyê bi daxuyaniyekê ragihand ew hemû hêzên xwe yên li nav sînorên Tirkiyê, li cihên ku rîska pevçûnê çêdike û rê li ber provokasyonên muhtemel vedike, ji bo pêkanîna vekişandina li Qadên Parastina Medyayê li ser erêkirina Rêber Abdullah Ocalan pêk tînin. Hate gotin ku beşek ji koman gihîştine Qadên Parastina Medyayê û niha divê daxuyaniyê de beşdarin.

# Çekdanîn û vekişandina ji sînor ne teslîmiyet e

Akademisyen Kamîran Berwarî diyar kir ku bi banga dirokî ya Rêber Apo re Tevgera Azadiyê derbasî pêngaveke dîrokî bû û got, "Çekdanîn û vekişandina gerîla ji sînorê Bakurê Kurdistanê, ne teslimiyet e, lê belê gavên ji bo pêkanîna aştiyê ne."

**Tekoşîn Amara**

Di derbarê çekdanîn û vekişandina Gerîla heman demê de nêzîkatiya dewleta Tirk ji pêvajoyê re. Akademîsyen Kamîran Berwarî ji Rojnameya me re axivî.



### 'Bê mûxatab aştî ne pêkan e'

Kamîran Berwarî diyar kir ku pêvajoya ku Rêber Apo di 27'ê Sibatê de dabû destpêkirin ne pêvajoyek ji rêzê ye, ew encama tekoşîn, kar û xebatên 50 salên şoreş, şerê çekdarî , xebatên siyasî û rêxistinkirina civakê ye û wiha got: "Gelê Kurd di 27' salên ku Rêber Apo di bin tecrîda giran de dihat ragirtin li derdora wî bûn xelek, dost û dijminê gelê Kurd careke din gihaştin wê baweriyê ku bê mûxatabê aştiyê aştî ne pêkan e. Pêngava dîrokî ya aştiyê ku Rêber Apo avêtiye lazim e dewleta Tirk rêz lê bigirtiba. Tevgera azadiyê li ser daxwaza Rêber Apo şerê çekdarî rawestand û bi lidarxistina Kongreya xwe ya 12'mîn re xwe fesix kir û ji bo pêkanîna aştiyê hindek biryar girt. Bê ku tevgera azadiyê zirarê bibîne bi awayek sembolîk gava yekem li ber çavê cîhanê çekên xwe îmha kirin, tevgerê bi vê nêzîkatiya xwe careke din diyar kir ku ew li dijî xwînrijandinê ne."

### 'Pêngava dîrokî rênîşaneya aştiyê ye'

Berwarî bal kişand ser pêngava dîrokî ya vekîşîna gerîla ji Bakûrê Kurdistanê û wiha domand: "Pêngava ku tevgera azadiyê avêt pêwîst e dewleta Tirk baş bixwîne û nekeve şaşitiyan ku dijbertiya wê dike. Gava duyemîn ya ku tevgerê avêtiye ji bo dewletên heremî û dewleta Tirk girîng û biwate ye, lê heta niha jî em dibînin ku dewleta Tirk tu gav neavêtiye. Ew pêngava tevgerê rêvekirina li pêşiya aştiyeke mayînde û dawîanînaşer û pevçûnan e. Ev jî di hêzên cîhanî de yekem tevgera ku pêngaveke dîrokî diavêje. Pêngava vekişandina Gerîla ya ji Bakûrê Kurdistanê nîşaneya biryara Kongreya 12'mîn e. Tevgera Azadiya Kurdistanê pêşengtiya wê dike ji tevahiya cîhanê re aşkere kirin ku ew ji aliyê aştiyê ne. Eger pêngavek wiha bersiva wê hebe jî di demek nêz de gelê Tirk û Kurd û dewleta Tirk wê bigihêje hindek encamên erênî ji bo tevahiya gelên Rojhilata Navîn wê xebat û tekoşînê proseya aştiyê pêk bîne."

### 'Dewleta Tirk ne alîgira pêvajoya aştiyê ye'

Kamîran got ku dewleta Tirk ji aliyekî ve behsa xuşk û biratiya kurd û Tirkan dike li aliyên din jî bo ku êrîşên xwe li Başûrê Kurdistanê û Iraqê bidomîne û wiha axivî: "Dewleta Tirk Teskereyên leşkerên xwe ji bo 3 salan li wan herêman dirêj kir. Ev tê wê wateyê ku dewleta Tirk ji bo gavavêtina aştiyê xwedê niyetek baş nîne. Hîn jî dixwaze xeyalên xwe yên Osmanî li Rojhilata Navîn bidomîne. Dewleta Tirk karanîna çekê ji bo xwe hêz dibîne, ne di ferqê de ye ku bi wan çekan êş û azar bi gelan dide kişandin. Dewleta Tirk ger dixwaze aştî pêk bîne, divê leşkerên xwe yên li Iraq, Sûriyê û Başûr bikşîne."

### 'Divê diyalog hebe'

Kamuran anî ziman ku kiryarên dewleta Tirk û pêvajoya aştiyê pir ji hev cûda ne û wiha bi lêv kir: "Dewleta Tirk û hikumeta AKP'ê bi gotina dibêjin em pêvajoya aştiyê dipejirînin jî, lê li kêleka vê yekê jî dijminatiya xwe ya li hemberê gelê Kurd didomînin. Ji bo ku Rojavayê Kurdistanê dagir bikin destkeftiyên Kurdan têk bibin her carê di daxuyaniyên xwe de tehdîdan dikin. Di heman demê de li Başûrê Kurdistanê bi hevkariya Îraqê û hin hêzên din ên Başûrê Kurdistanê, Şengal û Maxmûrê dagir bikin ku gelê Mexmûrê careke din neçarî Tirkiyê bikin. Li hêleke din dijminatiya xwe ya li hemberê Gerîla hîn jî bi gotina "Teror" didomînin. Ji bo pêkanîna gavên yasayî divê dewleta Tirk xebatê bide meşandin, cihê kuştin, talankirin û komkujiyan siyaseteke dîplomatîk ya diyalogê li pêş bixe, ne tenê li cem tevgera azadiyê pêwîst e li Îmraliyê, Qendîl, Rojava diyalogan li pêş bixe. Lê divê dewleta Tirk bizanibe ku endazyarê projeya Aştî û Civaka Demokratîk ku bingeha wî daniye ji bo gelên Kurd û Tirk bi awayak aştiyane bigîhijin bingeha çareseriyê ew jî Rêber Apo ye."




### 'Pêwîst e dewlet yasayên xwe biguhere'

Berwarî anî ziman ku ev 27 sal in ku Rêber Apo bi awayek bê hiqûqî di bin tecrîdeke giran ya îşkenceyê de li zindana îmraliyê de tê ragirtin û wiha raber kir: "Rêber Apo ji aliyê hêzên komloger ve bi awayek hovane hat girtin û radestî Tirkiyê hat kirin. Ger em tekoşîn û berxwedana Rêber Apo ya 27 salên li Girava Îmraliyê bigrin dest, wê bi hezaran pirtûk û roman werin nivîsandin. Divê ku dewleta Tirk berya her tiştî, yasayê xwe biguhere. Hîn jî hukmê Ataturk li ser Tirkiyê heye rûxmê ku bi sedan destûr û yasa hatin guhertin jî, lê destûra Tirkan heta niha nehatiye guhertin, ji ber ku ew yasa û qanûnên ku Ataturk danîne ew in. Bi pêvajoya ku Rêber Apo daye destpêkirin re pêdivî heye ku Tirkyê destûra xwe li gorê 52 Netewên li Tirkiyê dijîn bê guhertin. Dewleta Tirk jî baş dizane ku ev axa ku dewleta Tirk û gelê Tirk li ser dijî ne axa wan e, ew gel ji Tirkmenîstan û Mexolê koçî axa Kurdistanê kiriye, ji ber wî jî ji bo bi hev re jiyankirina gelan divê destûreke siyasî û demokrasî bê derxistin. Ger sîstemeke demokrasî, saziyên demokrasî û yasayên demokrasi li Tirkiyê werin bicîhkirin pêwîst e berya hertiştê ew biryarên yek netew, yekal, yekmilet û yekol bên rakirin, eger ev neyên kirin wê tiştek bi navê demokrasiyê nemîne."

### 'Avabûna komîsyonê pêngavek girîng e'

Akademisyen Kamîran Berwarî nirxandinê xwe wiha bi dawî kir: "Komîsyona ku li parlementoya Tirkiyê hatiye avakirin her çiqas hevsengiyeke tê de nebe jî, pêngavek girîng e ji bo Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk e. Heta niha jî gelek alîgirên dewletê û hikumetê li hemberê biryara avabûna komîsyonê razî nînin, ji bo ku pêvajoyê manûpûle bikin her cure êrîşên xwe pêk tînin. Di cîhanê cara yekem hêzêke wek Gerîla ku li ser exlaq û wîcdan hatiye avakirin, erka xwe ya di parastina mirovahiyê de xwedî pîroziyeke. Ji ber wê jî roj bi roj girîngiya Gerîla di cîhanê de belav bû. Dema ku çeteyên DAIŞ'ê êrîşî Şengal Başûr, Rojava û Mexmûrê kirin yekem yên ku xwedî li gel derket Gerîla û Tevgera Azadiyê bû. Hêzên Hevpeymaniya Navdewletî beşeke ji wan jî Tirk ve tevger wek terorîst îlan kirin. dema ku Ewropa û Amerîka PKK'ê û tevgera azadiyê kirin lîsta terorê ew tenê ji bo qeneatkirina Tirkan bû. Di encam de ev gavên ku hatin avêtin ji bo gelê Rohlata Navîn gavên dîrokî ne."



## Dilê dadweriyê li Rojava lêdide

**Sînan Cûdî**

Dadgehek xeyal bikin. Banên bilind, dîwarên spî. Dadwerekî cil û berg li pêşiyê radiweste, bersûc, şahid, dozger li hember wî...
Hemû çav ber bi jor ve ne, ber bi kursiya ku "biryar" lê tê dayîn ve. Ev dîmen bi hezaran salan heman wateyê diparêze: hêz li jor e, dadwerî di siya wê de ye. Lê li Rojava, rewş guheriye.
Edalet êdî ji jor ve nayê xwarê, ji jêr ve derdikeve; di civînên komîn, civînên giştî û komîteyên dadweriya jinan de. Êdî kesek tenê biryaran nade; dadwerî ne dengekî yekane ye, lê pirjimar e.
Aliyê herî bêhempa yê pergala ku li van axan hatiye damezrandin, avakirina nîzamên qanûnî ya bêdewlet e.
Ji ber ku Rojava dadweriyê ne tenê wekî "qanûn", lê wekî celebek rêxistinê ji bo jiyanê dibîne.
Li vir, dadwerî hevsengiyek exlaqî ye, şêwazek jiyanê ye ku ji qaîdeyên nivîskî pêştir e.
Dema ku di navbera du malbatan de li gundekî nakokî derdikeve, doz naçe dadgeha navendî; komîn dicive, alî diaxivin, komîteyên lihevanîne li wan guhdar dike, nûnerên ji komîteyên jinan tevlî dibe û carinan heta zarok jî dikarin ramanên xwe bînin ziman. Piştre biryarek tê dayîn: "Em çawa dikarin birînê baş bikin?"
Bi gotineke din, edalet dibe kiryarek sererastkirinê, ne cezakirinê. Ev tam wekheviya qanûna demokratîk e, ku Rêber Ocalan wekî "wijdanê civakê" pênase kiriye. Di seranserê şaristaniya dewlet de, edalet her gav di xizmeta milk, hêz û desthilatdariyê de maye. Heman avahiya hêzê, qanûn nivîsandiye, bicîh aniye û parastiye. Lêbelê, li Rojava, dadwerî ji vê zincîrê xilas dibe. Komun ne tenê şûna dewletê digire, ew wijdanê rêxistin dike. Niha, dadwerî ji ezmûnên rojane yên mirovan, nirxên exlaqî û girêdana bi jiyanê re çêdibe. Meclîsên Dadweriya Jinan di dilê vê şoreşê de ne. Ji ber ku bi hezaran salan e, qanûna ku ji hêla mêran ve serdest edaletê wekî "xwedîtî" pênase kiriye. Lê jinên li Rojava edalet wekî "şêweya parastina jiyanê" ji nû ve ava kirine. Di dozek şîdeta mêran de, encumena jinan ne tenê li ser cezakirina sûcdar, lê di heman demê de li ser veguherîna civakê jî nîqaş dike. Pirs ev e: "Ev civak çawa dikare pêşî li dubarebûna sûcên wiha bigire?"
Bersiva vê pirsê edaletek ji cezakirinê mayîndetir peyda dike. Fikra modernîteya demokratîk li vir tê temsîlkirin. Dadweriya modernîteya kapîtalîst ferdî wekî sûcdar kod dike. Modernîteya demokratîk hewl dide ku ferdî ji nû ve di nav civakê de entegre bike. Dewlet li berdewamiya rêzikê digere; civak li berdewamiya jiyanê digere. Ev cûdahî dibe ku cûdahiya herî bingehîn be ku têgihîştina edaletê li Rojava ji yên din ên cîhanê cuda dike. Li Rojava, edalet ne tenê di navbera mirovan de lê di heman demê de bi xwezayê re jî tê damezrandin. Beşa 7emîn a Peymana Civakî dibêje ku "xweza hebûnek e."
Ev gotinek pir kêm e di dîroka hiqûqê de. Bi gotineke din, çemek, perçeyek erd, darek; hemî wekî mijarên hiqûqê têne hesibandin. Zirardayîna xwezayê, sûcek li dijî civakê ye. Bê guman, pergala hiqûqî ya Rojava ne bêkêmasî ye. Lê tiştek bi dest xistiye: navenda edaletê ji dewletê ber bi mirovan, civakê û xwezayê veguheztiye.
Û ya herî girîng, vê pergalê careke din edalet bi "jiyandina mirovan" ve girêdaye. Têgeha "xweparastinê" ya Rêber Abdullah Ocalan di vê nuqteyê de diyarker e: edalet tolhildan nîne; ew parastina rûmeta jiyanê ye. Bi gotineke din, civak dikare xwe bi qasî ku dadmend be biparêze. Dadwerekî pêşerojê yê ku li Rojava hiqûqê dixwîne êdî tenê qanûnan jiber nake. Ew dersên li ser dîroka şaristaniyê, şêweyên desthilatdariyê, jidayikbûna dewletê, modernîteya kapîtalîst û modernîteya demokratîk digirin. Ji ber ku armanc li vir ne "dabeşkirina edaletê" ye, lê têgihîştina edaletê ye. Û têgihîştin her gav kiryarek radîkaltir e ji jiberkirinê. Li Rojava, edalet barê rabirdûyê hilnagire; ew tovên pêşerojê diçîne. Dibe ku ji ber vê yekê be, li welatên herî şer ên cîhanê, edalet ji nû ve çêdibe; bi bêdengî, di komînan de, di destên jinan de û di wijdanê dadgeran de.



# 'Çarenûsa Kurdistan û Rojhilata Navîn ne şer e'

Jinên Ciwan yên PYD`ê diyar kirin ku baweriya wan bi pêvajoya aştiyê heye û bi beşdariya ciwan û tevahiya civakê wê aştî û jiyana hevgirtî pêk were û gotin, "Divê ciwan bi çalakiyên cuda beşdarî pêvajoya aştiyê bibin, ji ber ku çarenûsa Kurdistanê û Rojhilata Navîn ne şer e, Rêber Apo rê li ber azadiya gelan vedike."

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Rêveberiya Tevgera Azadiyê ya Kurd bi daxuyaniyek çapemeniyê de li Binarê Qendîlê gava dîrokî ya ku ji bo rê li ber pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk avêtiye ragihand. Di daxuyaniyê de Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Sabrî Ok, Endama Fermandariya Eyaleta Serhedê ya YJA Starê Vejîn Dersîm û Endamê Konseya Fermandariya HPG'ê û Fermandarê Eyaleta Garzanê Devrîm Palu ku ji Bakurê Kurdistanê hatîn Herêmên Parastinê yên Medyayê jî di nav de 25 gerîlayên azadiyê amade bûn. Ev gavên dîrokî ji bo pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk e, da ku şer, alozî û pirsgirêkên di rojhilata Navîn de çareser bibe. Lê heya niha ev gavên çareseriyê tenê ji aliyê Rêber Apo û Tevgera Azadiyê tên avêtin. Dewleta Tirk heya roja îro tu gavên erênî ji bo pêkanîna pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ne avêtiye. Di vê çarçoveyî de endamên Jinên Ciwan yên PYD`ê Dilîvan Reşîd û Sîlva Haco ji Rojnameya me re axivîn.

### 'Ev gav ji bo giştî gelên aştîxwaz guhertineke dîrokî ye, ne teslîmiyete'

Dilîvan Reşîd da zanîn ku gava dîrokî ya 26`ê Cotmehî ji bo pêkanîna aştyê ye û wiha nerxand: "Gava dîrokî ya ku di 26`ê Cotmehê de ji aliyê Tevgera Azadiyê ve hat avêtin, ev gav bi daxuyaneyeke fermî hat eşkere kirin ku hin gelîlayên aliyên sînorên Tirkiyê dimînin, vekeşiyan. Bêguman ev negava yekema ku Tevgera Azadiyê ji bo pêkanîna pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, diavêje, wek tê zanîn ku di 11'ê Tîrmehê de 30 gerîlayên PKK'ê bi merasîmekê çekên xwe şewitandinê de, bi awayekî fermi hat ragihandin, li gor ev gavên dîrokî ku Tevgera Azadiyê diavêje, dewleta Tirk heya niha tu gavên erênî ji bo pêkanîna pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ne avêtiye. Niha hincetên dagirkeriya Tirk nema ye, ji ber vê yek gavên ku vê care were avêtin, wê ji aliyê wî be. Rêber Apo û Tevgera Azadiyê ji bo jiyaneke saxlem û aram gav evêtin, lê bila dewleta Tirk ne fikira ku hêz û îradeya me têk çû, tenê ji bo gel jiyaneke bi aştî û aram bijîn, Tevgera Azadiyê çekên xwe şewitandin. Dema ku Tevgera Azadiyê çekên xwe şewitandin, pêwîst bû ku dewleta Tirk fam bike, ji ber ku me çekên xwe radestî wî nekir û bi rengekî pîroz bi destê me hatin şewtandin. Ev yek dide diyar kirin ku ne gelê kurd û ne jî çekên xwe radestî dewletên hegemon dikin. Ev gavên ku hatin avêtin ji bo me û giştî gelê aştîxwaz guhertineke dîrokî ye, ne teslîmiyete."

### 'Baweriya me heya dawiyê bi Rêber Apo û Tevgera Azadiyê heye'



Dilîvan Reşîd



Sîlva Haco

Endama jinên Ciwan Dilîvan Reşîd di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: "Pêwîst e êdî dewleta Tirk gavên erênî ji bo pêvajioya Aştî û Civaka Demkratîk bavêje, beriya her tiştî pêwîst e Azadiya Rêber apo ya fîzîkî pêk were, di heman demê de hemû heval, dost û ciwanên me ji girtîgehan derbixe. Êdî ev nema tê qebûlkirin. Mafên wan kesan jî heya ku jiyan bikin. her wiha em jî wekî ciwan baweriya me bi Rêber Apo û Tevgera Azadiyê heya ku wê jiyaneke aram ji bo tevahî Rojhilata Navîn mesoger bikin. bêguman çalakiyên me jî wê dewam bin heya em Azadiya Rêber Apo pêk bînin. Ji ber ku hevalê ciwanan yê herî nêz Rêber Apo ye, ev hevaltiya wî jî, ji bo me hêzekî mezine."

### 'Em ketine qonaxeke duyemîn û pir girîng'

Di heman çarçoveyê de Sîlva Haco diyar kir ku dewleta Tirk dixwaze hêza kurdan bide pişaftin û wiha doman: "Di van gavên dîrokî yê ku ji aliyê Rêber Apo û Tevgera Azadiyê tên avêtin, guhertinên pir mezin bi xwe anî. Ji ber vê yekê, lê mirov dema ji xwe di pirse ka hikûmet û dewleta Tirk çi gav avêt, tenê yê ku xwedî li pêvajoya heyî derdikeve û diwaze jiyaneke aram di Rojhilata Navîn de pêk were, gelê kurd in, heya niha me nedîtiya ku dewletên din jî gav avêtine. Bêguman gavên berbiçav hene ku divê werin avêtin. Heya niha tu gav û pêşketin ji aliyê dagikeriya Tirk çênebûye. Tevgera Azadiya bi ragihandina vekişîna Gerîlla ji aliyên sînorên Tirkiyê, em ji wan bawer dikin ku em niha ketine qonaxeke duyemîn û pir girîng de. Lewma bila dewleta Tirk hincetên çewt ji xwe re denexe ku niha serê xwe bi Rojavayê Kurdistanê jî diêşîne, ji bo tenê QSD`ê çekê xwe deynin."

### 'Rêber Apo rê li ber aştiyeke mayinde û azadiya gelan vedike'

Sîlva di dawiya axaftina xwe bal kişand ser erka ciwanan di vê pêvajoya nû de û wiha pê de çû: "Divê em baweriya xwe bi pêvajoya aştiyê bînin û bi beşdariya ciwan û tevahiya civakê aştî û jiyana hevgirtî pêk were. Pêwîst e ciwan bi çalakiyên cuda beşdarî pêvajoyên aştiyê bibin û pêk bîne. Weke Ciwanên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, têkoşîn, berxwedanî û sîstema me jî ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û nenavendî pêwîste gavên mezin û giran werin avêtin, ev ne hewildan e, lê têkoşîneke ku em bi îsrar in di Sûrî û bi giştî cihanê de reng û hebûna xwe mayinda bikin. Em dibînin ku Rêber Apo ji bo jiyaneke demokratîk, bi gavên hevbeş, ew dikarin bibînin ku çarenûsa Kurdistan û Rojhilata Navîn ne şer e. Rêber Apo rê li ber azadiya gelan vedike."









FENER



## Aqil Malê Esad Be Aqûbet Jî Dê Li Cem Esad Be!

**Idrîs Henan**

Piştî ku rejîma Baas hilweşiya û itîfaqa 10 Adarê hate îmzekirin, şer li Sûriyê hate rawestandin û rê li ber komkujiyên hê mezintir li Beravê hate girtin. Lê rejîma HTŞ carek din ew peyman bipê kir û meha Tîrmehê li Siwêdayê li dijî Durziyan qirkirin pêk anî. Di encamê de hevsengiya hêzê û destwerdanê li Sûriyê guherî, tesîrek neyînê li şiklê itîfaqan kir, metirsiyên heyî zêdetir û bilinditir bûn ku rejîmeke tundrew e hewl dide li gorî fikrên Baas ên navendiyeke hişk, her tiştî daqurtîne û yekdestariyên hê xirabtir ên xwe dispêrên zihniyeta kevneperest û paşverû, ava bike.
Li gorî piratîka li ser erdê ku rola dagikeriya Tirk a beloq bi awayekî pir dirû radixe ber destan, diyar dibe ku berfirehkirina mêtingeriya Tirk ji axa Sûriyê re, êdî asta metirsiyên ewlehî, wek ku idîa dike, derbas kiriye û veguheriye projeyeke siyasî, aborî û demografî yê pir xirab. Hebûna bi vî rengî ku bi qebedaytî tê ferzkirin, hêz daye ototrîteya defakto ya li Şamê ku bêrewatiya xwe jî weke meşrû xuya bike. Lew re, potansyela wê ya milîsîtiya komkujiyan dike û li pey rêbazên rêbendan e, zêde dike û bi dagirkeriyên cuda yên li ser axa Sûriyê re dikeve hemahengiyê ku nirxên gelan dadixe peyasê.
Li gorî azweriyên Tirkiyê yên bê Sûriyeyiyan avakirina (Sûriyaya nû) ku di bin serweriya wê de be, li gorî berjewendiya wê jî saziyên dewletê û desthilatdarokên xwecihî ava dike. Ji bona vê jî em dibînin ku nasnameya hemwelatiya Sûriyê didin terorîstên biyanî yên ku di bin navê (Cîhadê) de rûmeta gelên Sûriyê hetikandine û li ser ked û xwîna wan jî rewa dikin. Rejîma HTŞ bi van nêzîkatiyên xwe hewl dide dagirkeriyên heyî bi maske bike û axa Sûriyê jî, di bazarên hêzê de, bixe metodekî tekûzkirina serdestiya Enqerê û guherîna nasnameya demografîk û çandî ya herêm û bajarên Sûriyê.
Nêzîkatiyên desthilata HTŞ di korala konsertên dagirkeriya Tirk de, enstroment û awazên bêdeng in. Ango; li kuderê Tirkiyê êriş kiriye wê serî tepisandiye, qebûl kiriye û ji bo rewatiya wê jî xebitiye! Yanê halekî otopişaftinê ye ku bi projeyên stratejîk yên neoosmanî re bûye hevdeng û rimek li ser milê wê ye. Bandora van nêzîkatiyan şiklên dagirkeriya Tirk ên siyasî, aborî û demografî li Sûriyê kûrtir kiriye û hema bêje ewqas ji rêze kiriye ku beşek gelên Sûriyê tûşî razana bin siya dara bêhelwestiyê kiriye. Lewe re jî em dibînin hemû çînên civakî, çi karker û cotkar bin, çi jî akademisyen û zanyar bin, xistine yek sewiya fikrandinê ku asta xîtaba nefret, kîn, tund û tûjiyê bilindtir kiriye û mirovên bê wîjdan afirandiye.
Îroj tekane projeya gelan a ku dikare rê li ber vê filitîna exlaqî bigire ew e, projeya demokratîk a Bakur û Rojhilatî Sûriyê ye. Heyama heyî maskên rizyayî weşandine û êdî gelên Sûriyê yên heyranê azadî û demokrasiyê ne, berê wan li Rêveberiya Xweser û QSD ne ku tekane xilasteka wan a rasteqîn e. Asta dispilîn, rêxistinbûn, pabendî, dilsozî, wêrekî û vîna guherîn û entegrasyona demokratîk a ku QSD raber kiriye, baweriya gelên Sûriyê bi armancên wê jî mezintir kiriye. Bi vê hîncetê jî, desthilata HTŞ, bi talîmatên Tirk, bi xiror û xwenên xwe yên mayîndekirina desthilatdariyê re ji xwe bawer kiriye ku bi xirakirina itîfaqa bi QSD re wê hêza gelan a demokratîk derb bike û dê tevayî îradeya gelan di coka xwe de biherikîne! Êdî ev jî mijareke ku meydanê îsbat kiriye ye. Yanê çendîn wê hişmendiyê sûd li Esad kiribe, wê li HTŞ jî bike. Bi gotinek din, eger HTŞ di dijatiya gelan de, weke rejîma Esad, bi israr be, wê aqûbeta wê jî ya Esad bi xwe be.